
# BABA YADGAR

**Jînnîgarname**:

Yek ji heft Ten û sazmendên dînê Yarsanî û pîrê herî mezin ê Yarsanîyan "Baba Yadgar"e. "Ahmed yan Seyd Ahmed"e. San Sahak nasnavê "Baba Yadgar" bexşiye wî û weku malbata "Baba Yadgar"ê jî avabûn. Gor Serencamnameyê di sala 1359 – 1360an li gundê "Şêxan"ê de zad bûye. Gor Yarsannasan Baba Yadgar zêdetirî sed salan jiyaye û nezewiciye anku zarokên wî jî tune bûye. Di sala 1480an de ji aliyê hin kesên nenas û nezan ve bi awayekî nediyar û penhan tê kuştin, lê li ser çawanî û sedema kuştina wî çu jêderkên berdest nîne. Li ser gorr û menzela wî hin nerînên cuda hene lê ya ku şênber in, ereng û meqama wî anku menzela wî yekem li nêzî "Serpêlî Zehaw"ê ye û duyem jî li nêzî bajarê Nînova yan jî Musilê, li gundê "Tulebend"ê ye. Mixabin gel hatina hêza reş a teroristên Daişê û dagirkirina pajek ji başûrê Kurdistanê, menzel û meqama Baba Yadgar jî kete ber plan û kiryarên Erebên daiş û gorr û menzela wî li gundê "Tulebend"ê hate teqandin. Helbet xeynî menzela Baba Yadgar, gelek pîrozgeh, peristgeh û şûnwarên Mîtrayî, Yarsanî û Zerdeştî û Êzîdî hene û mane, eger çi gelek ji wan jî hatine tune kirin û fena bûne.




**Xwendin û Zanista wî**:

Li bal San Sahakê mezinê Yarsanan fikir û rêbazê xwendiye. Baba Yadgar giringiyeke mezin û zêde daye teoriyên felsfeya Pirtewî(Îşraqî)yê û bawernameya bala yên fikirî, zanistî û rêbaza giyaniyê li bal San Sahakê wergirtiye. Pişt re li ser daxwaza San Sahak û ji bo rêşanî(îrşad)ê û kûrbûna zêdetir berê xwe dide welatê Hîdistanê û bo demekê li wir dimîne. Pişt re vedigere Kurdistanê û diçe gundê "Serane"yê li çiyayê "Dalaho"yê ya Zagros û girêdayî bajarê Kirmaşanê bo rênumayî û rêşaniya xelkî li ser dînê Yarsaniyê. Temenek û zemenekê li wir diborîne. Ji ber ku piraniya jiyana xwe li gundê "Serane"yê borandiye, weku "Seyd Ahmed Seraneyî" jî tê nasîn û gotin, her weha pişt re hêdî hêdî navê gund jî wenda bûye û bûye gundê "Baba Yadgar". Bavo Yadgar paşne xwe her du rêşan "Seyd Xeyal û Seyd Wîsalî"yê kir cihnîşa xwe, ewan jî ta dawîna temenên xwe banxwaziya xelkî dikirin ji bo ser dînê Yarsanî. Koka malbata Baba Yadgar jî vedigerin ser ew du rêşan û kesatiyên ku Bavo Yadgar kiribûn cihnîşa xwe.






**Xebatên Baba Yadgar**:

Baba Yadgar paşî xwe gencîne û berhemeke newaze û nayan li pey xwe hişt bi navê "**Zullall Zullall**"ê ku hejmareke zêde ji "bend"an digire xwe

û her bendek behsa rewşeke dînî dikin. Hin mînak ji bendên Zullall Zullallê ku dibêje:

**Zullallî koy tat, Zullallî koy tat**
**Îbrahîmî min, Zullallî koy tat**

**Çagan ẋulaman, We yed dan sewqat**
**Padişam şabî, namiş bê ew qat**

**Ez Yûnis beyam, Mahîm  weẋir daqînat**
**Kakem amahê, weẋir da qîniyat**

Yan dibêje:

**Zullallî koy zeman, Zullallî koy zeman, yadgarenan zullall koy zeman**.

**Caga ẋulaman cem bîn celaman, namiş guştasep be, şam we bêgu**man.

**Ez ew nawis bîm roşen kerdim man, kakem Zerdeşt bî, pûrey espîtman**.

*Têbînî: Piştî zêdetir ji 600 salan, hê berhem û pirtûka "Zullall Zullall"ê hê çap nebûye û bêkes û bênaz maye.*

//Qendîl Şeyxbizînî
Hewlêr